

# Heke tu dest bi xwendina sfi (perwerdeya swêdî ji bo bîyanîyan) bike?

Vêca pêwîste ku tu berê vena bixwîne.

## ji bo xwendina tamrojî qaîde hatine guhertin.

Ji 5ê tebaxê 2019 an pê de, di hefteyê de, 25 saetan perwerde tê pêşkêşkirin, da ku mirov bigihêjî perwerdeya tamrojî. Ev tê vê maneyê; heke tu, di hefteyê de 15 saetan sfi di sinif de bixwîne, pêwîste ku tu 10 saetên din jî, li Komvux (xwendin û xwehînkirina salmezinan ya beledîyeyî) kursek bingehî, yan jî kursên inglîzî / yan jî kursa matematîkê bixwîne, yan jî tu dikari hem kursa inglîzî hem kursa matematîkê bixwîne.

## Kursên bingehî yên li xwendin û xwehînkirina salmezinan (Vuxenutbildning)

- Şîyan û jêhatina dijîtal ê (ev çend sewîye ne) 15 saet
- Jîyana karî û bazara (pîyaseya) karî li Swêdê (ev çend sewîye ne) + 10 saet
- Bingehîya inglîzî, matematîk, danûstendin û agahîya civakî = 25 saet
- Dersên xwezazanî yên bingehî û teknîka perwedeyê
- Berdewamîya dersên xwezazanî yên bingehî
- Dersên zanista civakî yên bingehî û teknîka perwedeyê
- Berdewamîya dersên zanista civakî yên bingehî

## Gelo ev çawa çêdibe?

Vuxenutbildningen (xwendin û xwehînkirina salmezinan) kursek bingehî ji te re pêşniyaz dike, yan jî tu miracaetî kursên inglîzî û/yan jî yê matematîkê dike.

Piştî, di rojên karî û di navbera saet 9.00-16.00 an de, tu kursa sfi û kursên ku li sfi hatine îlavekirin dixwîne (guhertin karin çêbibin)

## Girînge

Heke ji ber sedemekê tu nikaribi kurseke bingehî bixwîne, divê tu forma sekinandinê (îptalkirinê) îmze bike û wêna teslîmî dibistana xwe bike. Bifikire ku, ev kari tesîrê li tezmînata te bike.

Heke tu kursa xwe ya bingehî îptal bike, dibe ku tezmînata ji aliyê daîreya karî û alîkarîya aborî ya ku ji aliyê beledîyeyê tê dayîn bê kêmkirin.

Ger zaroka te ya ku diçe pêşdibistanê hebe, girînge ku, tu miracaet bike ji bo ku wextê wê /wî yê li pêşdibistanê bê zêdekirin. Ger zaroka te ya ku diçe dibistanê hebe, dibe ku piştî dema dibistanê pêwîstiya wê / wî bi çûna mala dema vala (fritis) hebe.

## Agahîya zêdetir

Ger pirsîyarên te hebin, têkilîye bi Navenda xizmetê ya beledîyeya Borlänge (Borlänge kommuns servicecenter) re deyne yan jî serdana wir bike.

## Perwerdeya salmezinan